kurdisk Kurmanji
Kurdî Kurmancî

# Partiya Sor (Rødt) ji bo hevgirtin û dadperweriyê hilbijêre

Sor partiyeke radîkal, jinane û hevgirtinê ye. Em civateke wisa dixwazin ku xelk bihevre biryarê bidin, û ku kirîna desthilatê û bandorê têde ne mumkin be.

Me civateke hevgirtî, demokratî û dadperwer divêt, ne weke vê civata sermayedarî ya ku me îro heye. Sermayedarî li ser hevrikanê ava dibe û dibe sedem ku yên dewlemend li ser hisaba yên din hemûyan dewlemendtir bibin. Herwisa ew dibe sedemê şerî, gohurînên avûhewayî yên bi felaket, nejadperistiyê û tepeserkirina jinan.
Ji bo ku em bibin xwedî civateke dadperwer û jîngehdost pêdivî ye em her roj ji bo gohurîna civata ku em têde dijîn, kar bikin.

**Tevlî me bibin!**

**rødt.no**

Rødt

www.pdf-arkivet.no/ (2022)

## Yên dewlemend li ser hisaba Norweca-newekhev qezenc dikin

Ji 1990 û vir de cudayî li Norwecê ji USA zûtir zêde bûne. Cudayî di navbera yên ku ji hemûya bêtir pere hene û xelkê adî berdewam mezin dibe. Mal û milkên wan 10% yên herî dewlemend li Norwecê sê caran ji 90% yên din hemûyan bi hevre bêtir e. Ji 90 000 zarokan bêtir li Norwecê bi hejarî dijîn, di eynî demê de hejamra milyardêran her sal zêde dibe. Partiyên din tiştekî ji bo vê yekê nakin. Sorê divêt Norweca-newekhev bi dawî bîne.

**Sor kar dike ji bo:**
- bacê ji yên herî dewlemend re zêde bike
- kar ji hemûyan re
- ku karên sabit û dewama ful wê di jiyana kar de bibine rêsa (qaîde)
- zêdekirina sîgorta zarokan
- nehîştina wê yekê ku kesên medenî bikarin bi rêya xizmetên fermî weke baxçê zarokan û xaniyê nexweşan pereyan qezenc bikin

## Li dijî tepeserkirina jinan

Şik têde tune ye ku em di civateke wisa de dijîn ku xizmeta tepeserkirina jinan dike. Jin ji mêran kêmtir qezenc dikin. Jin tûşî zorê dibin ji ber ku ew jin in. Laşê jinan bi rêya pornoyî û laşfiroşiyê tê firoştin.
Sor daxwaza azadiya jinan ya tam dike, û herwisa kar dike ji bo:
- ku jin ji aliyê madî ve wê serbixwe bibin
- ku ew jinên ji şer û nakokiyan revîne wê mafê îqamê li Norwecê bistînin
- berdewam mafê biryardana zarok jiberxwebirinê û alavên pêşîlêgirtina hamlê bi belaş

## Xanî ji hemûyan re – ne bi tenê ji bo ew ên ku herî dewlemend in

Îro bazarê xaniyan we dike ku pir kesan pêçênabe xaniyekî ji xwe re bikirin. Buhayên kirê jî zêde dibin ji ber ku kirêçî pir xaniyan dikirin û alîkar dibin ku bi zextê buhayê wan bilind bikin.
Sor li gel siyaseta xaniyan ya civakî ye. Divê me siyaseteke xaniyan ya wisa hebe ku we bike hemûyan pê çêbibe xaniyekî bi standardekê baş û bi buhayekê qebûlkirî ji xwe re peyda bike.

www.pdf-arkivet.no/ (2022)

## Civateke vekirî û gelemperî

Îro gelek xelkê ku xelfiyeke kêmayetî heye di jiyana karî de, di bazarê xaniyan de, li jiyana derve û di ragehandinê de tûşî ferqûcudahiyan dibin. Sor li dijî hemû rengên ferqûcudahiyê û nejadperistiyê kar dike.

Sor di wê baweriyê de ye ku divê penaber û penaxwaz bi rêz û bi guhpêdanê bêne pêşwazîkirin. Divê derfet ji hemûyan re çêbibin ku zû bi kar bikevin. Kar baştirîn rêk e ku mirov bibe beşek ji civatê.

Sor dixwaze mafê hînbûna zimanî bi hêz bike. Me divê hînbûna norwecî ya bi belaş ji hemû salmezinan re misoger bikin.
Heke xwendekarên dibistanê hînbûna zimanê dayikê bixwazin ew dê wê yekê bi dest bêxin.

## Jiyana karî ya rêxistî û mafên wekhev

Bêkarî di van çendîn deh-salan de di nav koçberan de sê caran ji baqiya mayî ya şêniyan bilindtir bûye. Sorê divêt li hemberî ferqûcudahiyan di bazarê karî de têbikoşe og daxwaz bike ku qanûna jîngeha kar ji bo misogerkirina mafên wekhev ji hemûyan re bê bikaranîn.

Pirsgirêkek di jiyana karî de ew e ku pir kes karên demkî distînin û ku divê gelek di wezîfên nîvdewamî yên biçûk de kar dikin. Sor kar dike ji bo jiyaneke kar ku li wira kardarkirina (tewzîfkirin) daîmî û wezîfên tam rêsayek be. Em di wê baweriyê de ne ku hemû ew kesên ku li Norwecê kar dikin divê mercên meaş û - kar yên norwecî hebin.

Sor piştgiriya têkoşîna sendîkayên karkeran li dijî rewşa kar ya xerab û tawankarî di jiyana kar de, dike. Em kar dikin ji bo ku hemû karker wê tevî sendîkayên karkeran bin û beşdariyê di têkoşîna ji bo jiyaneke kar ya rêxistî de bikin..

## Li dijî şer

Norwec ji wan welatên duniyayê ye yên ku pircaran beşdariyê di şeran de dike. Ji 1990 û vir de Norwec heşt caran li dijî welatên din beşdarî di şeran de kiriye. Herwisa Norwec çekî ji pir welatên ku di şerî de ne, difiroşe. Li 2015 Norwec buhayê 2,4 miliyard kronan çek firote derveyî welatî.

Sor li Norwec partiyeke tikîtenê ye ku berdewam dibêje na ji bo ku Norwec biçe li dijî welatên din şer bike. Em di wê baweriyê de ne ku bombekirin nabe sedemê aştî û demokratiyê. Dema partiya Karkeran (AP) û partiya Sosiyalîst (SV) li ser hikûmî bûn, ew di kirîna firokên şer yên nû ji Wîlayetên Yekgirtî yên Amerîka (USA) de beşdar bûn û ji bo beşdarbûna Norwecê di şerê - Lîbiyayê de deng da.

www.pdf-arkivet.no/ (2022)

# Bibe endam di Sorê de

Jibo hilbijartina payîzê Sor wê bikeve nav Parlamanî. Ji bo ku em bigehin wê yekê divê çendîn kes bi me re bin. .

Em dixwazin bixêrhatina wan hemûyan bikin yên ku jibo têkoşîna li hemberî Norweca- newekhev, beşdariya Norwec ya şeran û siyaseta penaberan ya nejadperistî, têne digel me.

Werin bi me re kar bikin ji bo civateke bê tepeserkirina jinan û nejadperistiyê, lê ji bo civateke bi dadperweriya aborî û pêşketineke ku xwezaya ku em têde dijîn xerab neke.

Berdewam xelk têne digel me Sorê, ji bo ku bi hev re bin jibo dadperweriyê û li dijî sermayedariyê.

**SMS-ê bişîne:**
**Rødt + Nav û adres bo 2434 yan li rødt.no/innmelding binêre.**

**Di mediyayên civakî de Sor-ê bişopîne**

**fb.me/roedt** **@raudt** **@stemroedt**

**rødt.no**

www.pdf-arkivet.no/ (2022)